## Hewcetî bi piştevaniya perwerdehiyê ya taybet çi ye?

Hewcetî bi Piştevaniya Perwerdehiyê ya taybet derbarê zarok û nûciwaninan dikare were berçavgirtin ku ji hêla derfetên pêşketin û hînbûna xwe va bi awayekî Demdirêj tûşî nakokiyên bûne ku di perwerdehiya bêyî piştevaniya perwerdehiyê ya taybet da, piştevaniya ji wan têra xwe ne pêkan e.

Wan ji bo hînbûna serkeftî hewcetî bi şert û mercên taybet û alîkariyên kesane hene ku derveyî kiryarên perwerdehiya gelemperî ne.

Hewcetî bi piştevaniya perwerdehiyê ya taybet di yekemayetiyên piştevaniya hînbûnê da, pêşketina aqil, pêşketina hestbarî û civakî, pêşketina bedenîû tevgeriyanê, bihîstin û bînahiyê dikare were têderxistin.

## Xizmetên Perwerdehiya Taybet Ên Gerrok (MSD) Çi Ye?

Xizmetên perwerdehiya taybet ên gerrok pêkhatî ji kadroya perwerdehiyê hye ku xwedan nasyariya pisporî di warê têderxistin û piştevaniya perwerdehiyê ya taybet in. Ew rewşa hînbûnê û pêşketina niha ya zarokê te û çavkaniyên heyî vedikolînin û hin kiryaran ji bo piştevaniyên tewsiye û pêşniyaz dikin.

## Tu çawa dikarî beşdar bibî?

Ji bilî beşdariya çalak di gotûbêj û şêwirînan da tu dikarî bi raberkirina berwext a versiyona kopî ya hemî belgenameyên xwe yên heyî di vî warî da bo MSD'yê, piştevaniya biryardanê bi awayekî diyarker bikî. Ev belgename pêkhatî ji babetên xwarê ne:

- Belgeyên dermanî / pizîşkî / derûnnasî (di nav da axaftin-terapî, fîzyoterapî, navenda civakî-dermanî ya zarokan, navenda Autîzmê)
- Encamên test û lênihêrînên pizîşkê pispor
- Nêrîna derûnnasê dibistanê
- Belgeyên pêşketinê yên navenda miqatebûna rojane ji zarokan û piştevaniya seretayî
- Bernameya pêşketina perwerdehiyê

Eger derbarê zarokê te hewcetiya bi piştevaniya perwerdehiyê ya taybet were têderxistin, divê di dîzzaynkirina qonaxên derbasbûnê, wek mînak derbasbûna navbera dibistana seretayî û dibistana navîn, rewşek pêk were da ku îmkana dewama serkeftî ya piştevaniyê were dabînkirin. Ji ber vê yekê tu divê bilez dibistana wergir derbarê hewcetiya bi piştevaniya perwerdehiyê ya taybet a zarokê xwe haydar bikî û hin belgeyan weke rapora karzaniyêl, bernameyên piştevaniyê û raporên pêşketinê raber bikî.

LANDESAMT FÜR
SCHULE UND BILDUNG

Freistaat
SACHSEN

# Di rê da Bûn

## Ragihandina bo Dêûbavan Derbarê Têderxistina Hewcetiya bi Piştevaniya Perwerdehiyê ya Taybet

Dêûbavîn hêja,

Derbarê zarokê te muhtemel e ku hewcetiya bi piştevaniya perwerdehiyê ya taybet were têdertxistin. Ev gumanniha divê were vekolandin. Ji bo ku tu bi bêbiryarî, nîgeranî û pirsên li benda vê vekolandina dubare nPebî, em dixwazin derbarê qonaxên vê pêvajoyê û babetên girîng te haydar bikin.

Ji bo me gelekî girîng e ku we wek pisporên zarokê xwe ji destpêkê va di vî warî da pişkdar bikin. Tu zarokê xwe nas dikî û ji bo pêşketina wî daxwaza derfetên pêkan ên herî baş dikî. Kadroya perwerdehiyê ya dibistana zarokê te û dibistana zarokên istîsna wek pisporên piştevaniyê li dibistanê bi raberkirina şêwirînê li kêleka te ne.

Çaverêtî heye ku ev daxuyanî dîmeneke giştî ya seretayî derbarê peyvên herî baş û qaonaxên şêwirînê û pêvajoya têkildarî têderxistina hewcetiya bi piştevaniya perwerdehiyê ya taybet raberî te bike.

Tu dikarî hemî bingehên qanûnî li adresa www.revosax.sachsen.de bibînî:

- Qanûna dibistanê ji bo Eyaleta azad a Sachsen'ê (SächsSchulG)
- Rêzikên dibistanê ji bo dibistanên zarokên istîsna (SOFS)
- Rêzikên dibistanê ji bo dibistanên seretayî (SOGS)
- Rêzikên dibistanê ji bo dibistanên navîn û dibistanên navîn ên şevê (SOOSA)
- Rêzikên dibistanê yên dibistanên Hevpar (SOGES)
- Nimûneya rêzikên îdarî yên têkildarî piştevaniya perwerdehiyê ya taybet û Şêwirînê (VwV Muster sonderpädagogischer Förderbedarf und Beratung)

Weşan û Redaksyon: Landesamt für Schule und Bildung, Reichenhainer Straße 29 a, 09126 Chemnitz,
Telefon: +49 371 5366-0, E-Mail: poststelle@lasub.smk.sachsen.de, www.lasub.smk.sachsen.de

Dîzayn û Nivîsandin: September Markenführung GmbH | Çapkirin: Wagner Digitaldruck und Medien GmbH

**SONDERPÄDAGOGISCHE
DIAGNOSTIK
UND FÖRDERUNG**



## 1. Şêwirîn[1]

### Armanc
Şêwirîn derbarê hewcetiya bi piştevaniyê, çavkanî û piştevaniyê

### Naverok
- Gotûbêjên digel kesên peywendîdar di pêşketina zarokê te da
- Di rewşa pêwîst da şopandina zarokê te û atmossfera hînbûna te
- Abalîzkirina encamên test û lênihêrînên pizîşkî, derûnnasî û dermanî yên heyî[2]

### Beşdar[3]
- Hûn wek dêûbavên
- Zarokê xwe
- Kadroya perwerdehiyê (di rewşa pêwîst da pisporên perwerdehiyê[4])
- Mamosteyê MSD'yê[5]

### Encam
Mamosteyê MSD'yê rêziknameya encamê hevrê digel hin tewsiye û şîretan
- Derbarê piştevaniya kesane ya zarokê we li dibistanê,
- Kiryarên derveyî dibistanê bi berpirsyariya dêûbavan,
- Di rewşa pêwîst da derbarê şêwirîna zêdetir û
- Di rewşa pêwîst da derbarê destpêkirina pêvajoya têkildarî têderxistina hewcetiya bi piştevaniya perwerdehiyê ya taybet eyar dike.

Raberkirina daxwaza pêvajoya têderxistina hewcetiya bi piştevaniya perwerdehiyê ya taybet ji aliyê we an jî dibistana zarokê we va dikare bi cih were.

## 2. Têderxistin[1]

### Armanc
Naskirina hewcetiya bi piştevaniyê

### Naverok
Têderxistina perwerdehiya taybet, wek mînak:
- Gotûbêjên digel kesên peywendîdar di pêşketina zarokê te da
- Şopandin û raçavkirina zarokê te û atmosfera hînbûna wî/wê
- Ezmûn
- Abalîzkirina encamên test û lênihêrînên pizîşkî, derûnnasî û dermanî yên heyî[2]

### Beşdar[3]
- Hûn wek dêûbavên
- Zarokê xwe
- Kadroya perwerdehiyê (di rewşa pêwîst da pisporên perwerdehiyê[4])
- Mamosteyê MSD'yê

### Encam
Mamosteyê MSD'yê raporeke karzaniya perwerdehiya piştevaniyê amade dike ku tê da
- Hin nêrîn derbarê hewcetiya bi piştevaniya perwerdehiyê ya taybet ya gengaz pêk tîne,
- Hin tewsiye derbarê pêvajoya perwerdehiyê û cihê perwerdehiyê raber dike,
- Hin pêşniyazan derbarê piştevaniyê raber dike û
- Pêwîstiyên têkildarî cihê perwerdehiyê û xwendinê tên şirovekirin.

Tu versiyoneke kopî ji rapora karzaniyê werdigirî.

## 3. Komîteya piştevaniyê

### Armanc
Hin tewsiye û şîret derbarê dîzayna piştevaniyê

### Naverok
- Şiroveya rapora karzaniyê û şert û mercên serkeftinê ji bo piştevaniyê
- Derfet ji bo pirsên zêdetir û behsê
- Raderbirrîna hemî beşdaran

### Beşdar[3]
- Hûn wek dêûbavên
- Zarokê xwe[6]
- Di rewşa pêwîst da Rêveberiya Dibistanê
- Mamosteyê MSD'yê

### Encam
Encam di rêziknameyeke civînê da tên qeydkirin.

Di rewşa hebûna hewcedariya bi piştevaniya perwerdehiyê ya taybet da, hûn wek dêûbav dikarin di navbera perwerdehiya kesane ya zarokê xwe li dibistaneke asayî an jî piştevaniya perwerdehiyê ya taybet a giştalî li dibistaneke zarokên istîsna yekê bibijêrin. Rêveberiya dibistanê derbarê wergirtina zarokê we biryar dide.

Rapora karzaniyê û rêziknameya civînê ya encama Komîteya piştevaniyê bingeha biryardana Rêveberiya Eyaletî ya dibistan û perwerdehiyê ne.

## 4. Piştevanî

### Armanc
Dîzaynkirina pêvajoyên pêşketin û hînbûna serkeftî

### Naverok
- Piştevaniya armancdar û kesane
- Têderxistina perwerrdehiyê (taybet) hevrê digel pêvajoya
- Şêwirîn û hevrêtiya perwerdehiyê ya taybet

### Beşdar[7]
- Hûn wek dêûbavên
- Zarokê xwe
- Kadroya perwerdehiyê
- Pisporên din ên perwerdehiyê
- Kadroya perwerdehioyê ya têkildarî perwerdehiya taybet

### Encam
Hewcetiya bi piştevaniyê li gorî rewşa pêşketina kesane ya zarokê we ye û bi awayê berdewam tê vekolandin. Bi vî awayî dibe ku di pêvajoya perwerdehiya li dibistanê da hewcetiyeke bi piştevaniya perwerdehiyê ya taybet heta ji nû va were betalkirin.

1. Raberkirina daxwaza şêwirînê ji aliyê MSD'yê û her wiha daxwaza têderxistina hewcetiya bi piştevaniya perwerdehiyê ya taybet bi rêya dibistan an dêûbavan va pêkan e.
2. Têderxistineke pizîşkî bi awayê xwebixwe hewcetiya bi piştevaniyeke perwerdehiyê ya taybet pîne nake.
3. Kes û saziyên peywendîdar ên din dikarin di rewşa pêwîst da bi razîbûna dêûbavan bibin pişkdar.
4. Derbarê zarokên di rewşa derbaskirina kûrseke yeksalî ya amadetiya dibistanê da, pisporên perwerdehiyê yên navenda miqatebûna rojane ji zarokan di şêwirîn û têderxistinê da pişkdar dibin.
5. Xizmetên Perwerdehiya taybet ên gerrok
6. Beşdariya zarokê we biryareke hevpar li gorî berûlayên kesane ye.
7. Kesên din û hevkarên torê û aliyên hevkariyê yên derveyî dibistanê dikarin bibin pişkdar.